

Jimare 1
1985

Mîrkutên xwe bilind kin !

MÎR/KUT

KOVARA HER TIŞTÎ YE JI BO HER KESÎ YE



NO: 1/1985

ansvarig utgivare
och redaktör:

Mahmûd
L E W E N D Î

Abone:

sal/year/år/un an:
20SKr./20FF/2\$

Tarîxa çapê:

1/7/1985

Merheba

û

Rojbaş..!

Sibeha we bi xêr, roja
we bimbarek be. Maşalê xwe
dê tu kêmanîya we nede. Xwe
dê bi we re be, di her halî
de û bi her awayî ardimcî-
yê we be.

Eêêê, çawan in, baş in ?

Çi dikin, çi nakin, ero
we dî em jî derketin, ango
em jî daketin meydana ko-
var û rojnameyên kurdî.

Ev serê çend mehan e em
difikirîn ku em kovareke
çawa derxînin, axirê li da-
wîya dawiyê ;

bi saya hevalekî
em gihan biryarekî,

wele hema me go ji vê xwe-
şiktir kovar nabe û me na-
vê wê jî danî M Î R K U T
naveroka wê jî ji xwe waye
ji we ve xuyaye, gotina zê
de ne hewce ye.

Tenê tiştê heye ku di-
vê haya herkesî jê hebe:

1-Emê xwe"li bin çengê
pir kesan û pir tiştan xin.

2-Emê tiliya xwe di her
qulik(kun)î re kin.

Ji ber wê yekê divê hûn
carna li qusûr û kêmanîyên
me nenêrin, bibexşînin...!

De bi xatirê we,

Bimînin di xweşiyê de!

MÎRKUT

NAVEROK

Merheba û rojbaş.....	1
Naverok.....	2
Çend qatin.....	3
Can bi şûn de nayê.....	6
Çend peyvîkên nû	
Ma hişê wî heba.....	7
Çente.....	8
Pirtûkek nû.....	10
Du helbest.....	11
Lêkolînek/Lêkolîneweyek.....	12
Karîkatûrek ji MAMOSTE.....	16
Derdê xwe ji doktorê xwe re	
bibêje.....	17
Kontax.....	18
Serbûrtîyek.....	20
Bavê min jî dibêje.....	21
Rûresîyek.....	22
Du helbestên din.....	24
Hema bila biqîre.....	25
Nesthetek.....	26
Ji pencera rexnegîran.....	28
Navên kurdî.....	30
Lê bi rastî ez ne derewîn im	
Tehlîla kelîmeyên kurdî.....	31
Helbestek DADAÎSTÎ û	
Kurte romanek; OF.....	34
panyek.....	35
Hin nivîsên jimare 2.....	36

ÇEND GOTIN

Bi qasî ku min çav lê gerandiye, heta nuha nêzî çarsed(400) kovar û rojnameyên kurdî derketine. Ji wan hinek, ji hejmara xwe ya yekan û şûn de hatine qedexe kirin an jî, ji ber hin gelsên ekonomîk-siyasî jiyana xwe berdewam nekirine.

Ji alî her kesî de tê zanîn ku yekemîn rojnameya kurdî di 1898'an de bi navê KURDISTAN li bajarê Qahîre yê ji alî Miqdad Medhet Beg(ji mala Bedirxaniyan, Apê Celadet Bedirxan Beq e) ve hatiye derxistin. Ji wê rojê û heta îro gelek rojname û kovarên kurdî derketine, hinek ji wan hîna jî berdewam in.

Kovarên jiyandirêj; kovara HAWAR ku ji alî Celadet Bedirxan ve dihat derxistin û kovara Gelawêj ku ji alî Îbrahîm Ahmet û Alaadîn Sucadî ve dihat derxistin. Jiyana van her du kovaran li ser hev nêzî deh(10) salan ajotiye.

Gava ku mirov li naverok û zimanê rojname û kovarên kurdî dinihêre, piranî siyasî û kulturî û ji alî ziman de jî bi kurdî, kurdî-tirkî, kurdî-erebî kurdî-farisî an jî kurdî-zimanekî biyanî(zimanekî awrupayî) derketine. Hela hinek ji wan her çendî wek nav navekî kurdî li xwe kirine jî, lê ne bi kurdî ne ango bi zimanekî din hatine nivîsîn.

Di tarîxa rojname û kovarên kurdî de tenê pênc (5) kovar ji bo zarokan û kovarek jî ji bo jinan derketiye. Yekemîn kovara zarokan di 1945'an de li Mehabadê bi navê "Gir û Galî Mindalanî Kurd" derketiye. Ya duwem li Iraqê bi navê "Estêre" derketiye. Her sêyên din jî di pê 1980 yî re li Swêd bi navê "Hêvî", "Kulîlk" û "Hêlîn" derketine. Ji wan jî, "Kulîlk" û "Hêlîn" hîna jî berdewam in.

Kovara jinan jî sala 1958(?) an de bi navê "Huner" li Suleymaniyeyê derketiye.

Belê, bi kurtebirî me îstatîstîkek ji kovar û rojnameyên kurdî raxist ber çavan, vêca em werin ser meseleya din.

Wekî me li jorê jî got, bi qasî ku min çav lê gerandiye di nava van 400 kovar û rojnameyên me de, ez li kovareke mîzahî rast nehatim. Lê tenê di hin kovaran de niv rûpel an jî ji çara yekê rûpelekê ji bo mîzahê bi kar anîne, lê ew jî têr nake.

Bo Çi Mîzah ?

Belê bo çî ?

Ji bo ku di vî warî de tu gav nehatine avêtin, ji ber wê yekê divê hin gav werin avêtin. Hin tişt bêne şikandin, hin perde vebin, da bila mîzaha kurdî jî derkeve û têkeve meydana kultur û edebiyat û sen'eta kurdî. Her çendî hin kesan di eserên xwe de mîzah an jî hîciv (taşlama) ên mîzahî bi kar anîbin jî, lê wekî me li jorê jî got ne wekî kovar an rojname bûne. Her wekî, Sêx Rîzayê Telebanî⁴⁾ di gelek helbestên xwe de hîciv-mîzah bi kar aniye, hetta kelîme û tabîrên namahrem jî dexî bi kar aniye. Şairê mezin Dildar jî di hin helbestên xwe de wek hîciv mîzah bi kar aniye.

Belê, gotina me ew e, ku di nava kultur û edebîyata kurdî de divê cîyê mîzahê jî hebe. Her çendî hin kes ewê bibêjin "lo de nuha ne wext e, ma em milletekî bindest in, ma em û mîzah" û hwd. Lê bi min na! Erê em milletekî bindest in, lê ev nayê wê maneyê ku "em bindest bin, em tişteki nekin". Ji alî her kesî ve tê zanîn ku xebatên edebî-kultûrî jî perçeyek ji têkoşîna gelê me ye û her weha mîzah jî, dê di vê têkoşînê de roleke mezin û girîng bilîze.

Hin tişt hene ku mirov bi sedan pirtûkan li ser binivîse jî, mumkun e ku ji alî xwendevan an jî ji alî herkesî de baş neyêt fam kirin, lê gava ku ew tişt (buyar an meseleyek) bi karîkatur an jî bi çend gotinên mîzahî bête bi kar anîn, bi ya min carna dê hin baştir bête fam kirin.

Hîn gelek wext li pêş me heye, di hejmarên wêbê de emê hinekî din jî li ser vê bareyê ango li ser mîzahê bisekinin. Nuha jî emê bi kurtebirî çend gotinan li ser kovarê pêşberî we bikin, lê ji ber kê masîya cîh emê bi çend maddeyan rêz kin:

1-Mîrkut tenê îsal(1985) dê du hejmarên wê derkeve, ger pêş de îmkanên me çêbibin, emê ji du mehan carê yekê derxînin.

2- Zimanê Mîrkut tenê kurdî ye, lê bi hemû zaravayan(soranî, zazakî, kurmancî).

3-Mîrkut berhemên her kesî ger mîzahî be an jî lêkolînên li ser mîzahê be belav dike.

4-Nivîsên ku ji Mîrkutê re bête şandin, bi paş de nayên vegerandin.

5-Mîrkut ji ber ku kovareke mîzahî ye, mumkune ku "zimanê xwe dirêjî" pir tişt û pir kesan bike, divê ji nuha de bête zanîn ku ji qanûnên mîzahê, yek jî zimanê xwe dirêjî her kesî û her tiştî kirin e.


Heta hejmara din bimînin di xweşiyê de.

Berpirsiyarê Kovarê

('):

*Xir û mexrût û mudewer, sîpî û nerm û dû nîm
Her wekû komele befrê ke şeqî key be mişar.*

(Dîwanî Şêx Rizayî Talebanî,
çapî Bexdad, rûpel 16)



Hallo, hallo ! (elo, elo !)
 Mirkut derket bixwine,
 serê te di êpe? Mirkut bixwine,
 Tu ji malê geheriye? mirkut bixwine,
 Perê te tuneye? Mirkut bixwine,
 Tu ji bavê xwe auzi, mirkut bixwine,
 Tu dixwazi biçi Parisê, bê mirkut neqe,
 An tu dixwazi dergeyekê deyne bê mirkut
 Lo, de dew ji her tiştî berde were, daneyne
 ji xwe re Mirkutekê bikire bixwine, Mirkut derma e.

CAN BI ŞÛN DE NAYÊ LÊ ROJÎ TÊ !



Meha rojiyê ye, lê rojî(rocî) ketiye havînê. Wekî her kesî Apê Leto jî rojiyê digire. Heta nîvro îdare dike, lê di pê nîvro re ji tîna(têhna) nikare xwe bigire û hema bi dizîka diçe ser kaniyê û avê vedixwe. Û çima mellê gund ji wê de nayê! Ew jî ji bo destmêjê tê ser kaniyê, lê, dinêre ku Apê Leto avê vedixwe, û wele hema mellê me xwe pik dike û diqehere û bi ser Apê Leto de diçe û jê re dibêje:

—Lawo ma tu qet fêdî nakî, tu ji xwedê jî natirsî? Tu di vê rojiya remezanî mubarek de çawan dikarî avê vexwî, ma tu kafir î, tu çi yî!

Apê Leto:

— Melle , bi xwedê ez gelekî tîh bûbûm, ji têhna(tîha) qirika min edî ziwa bûbû û ez hinekî jî fikirîm ku çawa be rojî îsal biçe salê tê wê dîsa bê, lê heke ez ji têhna bimirim û ev can jî biçe êdi bi şûn de nayê. Ji ber wê min got çawa be rojî ewê salê tê dîsa bê, lê can bi şûn de nayê, û min vexwar..!




çend peyvikên nû

Ji zimanzanên me yê bi nav û deng Fîlolog Dr.Zimandirêj DEVJIHEVE çend roj berê di konferansa hemû zimanzan û zimannasên Kurdan de çend peyvik(wişe,bêje)ên nû pêşkêşî kesên ku beşdarî konferansê bûbûn kir.

Em jî li vê derê wan peyvikên ku Fîlolog Dr.Zimandirêj DEVJIHEVE pêşkêşî konferansê kiribû dinivîsin, da ji bo ku xwendevan tê bigihên ku ew di çi maneyê de tî bi karanîn Mumkun e ku rojekê hun di kovar an pirtûkekê de lêrast bî û jê fam nekin, ji ber wê em nuka wan kelîmeyan jibo we li vê derê dinivîsin.

- 1) BIYOLOJÎ = XULIQANDIYOLOJÎ
- 2) PSÎKOLOJÎ= HARÛDÎNOLOJÎ
- 3) HOSTES = FIREJINABÊBASK
- 4) PÎLOT = FIREMÊRÊBÊBASKAJOYÊBALAFIRE
- 5) SANSASYON= ŞEMATE
- 6) ENSTÎTU = MALAMUXTAR



ma hişê wî heba..!

Gundî hemû li dorê civîyabûn,wî jî li erebanê dixist û digot:

"Hê Allah, hê ! hê !

Selawat li nebî Muhemmed, hê hê !"

û carê rabû pê û li dora xwe zîz bû. Wek perwanê, li dora xwe zîz dibû û ji alîkî de jî li erebana xwe dixist ji alîkî de jî qesîde digot.

Ji gundîyan yekî ji gundîyekî din pirsî:

-Ero tu dibînî, çawa li dora xwe zîz dibe, eynî wekî perwaneyê. Gelo ma hişê wî naçe ?

Gundîyê din:

- Na lo ! Ma ger HIŞ di serê wî de heba qet weha dikir.



CENTE

M. Lewendî

Jinek ciwan dî dadgehê de gilyê mirovekî dîke. Hakim jê dîpirse.

- De ka bêje, gilyê te çî ye? Jinik

- Hakim efendî ez vî mervî giştî dikim. Lewra li ber otobosê dest avêt ji qırîka min de dikira ez bifetisandama û bikuştama.



Hakim vedigere ser mirovî û jê dîpirse:

- Te çîma xwest ku ev jinika bifetisanda û bikuştî, haa, de ka bibêje sebebê wê çî bû?

Mêrik radibe pê û dest pê dîke dibêje.

- Hakim efendî, weleh rast min dikira ew bifetisanda û

bikuştî, lê xelkê dora me ew jî destê min xelas kir an na minê ew bikuştî.

Hakim şaş dibe, metilmayî dimîne û dîsa dibêje:

- Ê de ka hela bibêje jibo çî? Mêrik dest pê dîke:

- Hakim efendî, seet pêncê



êvarê bû, ez jî kar derketim, û seet dî pênc û nîvan de jî mêvanên min wê bihatana malê, jî ber wê yekê dîviya ku ez hînekî zûtir biçyama malê. Û min lez kir ez hatim ber sekinoka otobosan li sekinokê em ketin rêza bilêt kirinê, wê gavê ev jinik jî li pêşiya min bû. Dor hat wê, çû ber giştê (ciyê bilêt firotinê) ez jî li dû wê me, lê ez gelekî lez dikim ku ez zû bilêtê bikirim û bigihîjim malê, jî ber ku mêvanên min li hêviya min in.

Vê jinikê destê xwe avê t
 ji çentê xweyê mezin de, de-
 vê çentê mezin vekir, çente-
 kî piçûk jê derxist û devê
 çentê mezin girt, deve çen-
 tê piçûk vekir, ji çentê pi-
 çûk pere derxist dîsa devê
 çentê piçûk girt û devê
 çentê mezin vekir, çentê
 piçûk xist hundurê çentê
 mezin û devê çentê mezin
 girt û di pê re pere da bilê t-
 firos, bilê tfiros bilê tek da-
 yê. Vê jinikê dîsa dest pê-
 kir, devê çentê mezin vekir
 çentê piçûk jê derxist, û de-
 vê çentê mezin girt, devê
 çentê piçûk vekir, bilê tê
 xist hundurê çentê piçûk û
 devê çentê piçûk girt, dîsa
 devê çentê mezin vekir,
 çentê piçûk xist hundurê
 çentê mezin û devê çentê
 mezin jî girt. Îcar bilê tfiros
 perê mayî dayê, vê jinikê



dîsa dest pêkir, devê çentê
 mezin vekir, çentê piçûk ji
 hundurê çentê mezin derxist,
 devê çentê mezin girt, devê
 çentê piçûk vekir, perê ji
 ber mayî, ku bilê tfiros da-
 bûyê xist hundurê çentê
 piçûk û devê çentê piçûk
 girt û dîsa devê çentê mezin
 vekir çentê piçûk xist hun-
 durê çentê mezin û devê
 çentê mezin jî girt.

Hakim hema radibe pê û
 dibêje:

- Te çima nekuşt, te çima
 nekuşt.....?



Zafar
 Tehmazin

AX ! XWEZKA
 EZ JÎ ZAROK BAMA !

AX ! XWEZKA
 EZ JÎ MEZIN BAMA



pirtûkek nû;

"Xwexwe

Xwebixwe

Xweşkirin"



Nivîskarê me yê mezin û ezîmşah û paye bilind û bêvil li hewa Yorgoyan BALÎFKITAN pirtûkeke nû derxist ronahîyê...!

Navê pirtûka wî:

" XWEXWE XWE BIXWE XWEŞKIRIN "

Her wekî hun jî dizanin nivîskarê me yê mezin Yorgoyan BALÎFKITAN ev pirtûka wî ya nîvê şêst û dudoyan e ku derket.

Ew di vê pirtûka xwe de bi taybetî li ser mewzûyekê sekinîye, belê bare,ango mewzû ev e:"Ji alî psîkolojîk û sosyolojîk û antropolojîk ve"xwexwe xwe bixwe xweşkirin"e.

Nivîskarê me di vê pirtûka xwe de hin rastiyên civatê jî bi awayekî ilmî-zanistî raxistiye ber çavan ku gelê me yê derketine derveyî welêt bi çî awayî "xwexwe xwe bixwe xweş dikin". Dîsa nivîskarê me di vê pirtûka xwe de de îddîayekê jî tîne ku li gor dîtina wî hin kes hene ku bi cimaatî"xwexwe xwe bixwe xweş dikin".

Belê bi kurtebirî em dikarin bibêjin ku divê her kes vê pirtûkê bikire û bixwîne.

Pirtûk li mala Muxtar peyda dibe, ger kesên ku bixwazin bikin divê li ser navnişana Malamuxtar nameyekê bişînin daxwaziya wê bikin.

AXXX...!

kat: 1948 piştî herba
cîhanê ya duemîn.

cêge: destpêk li korta Sêweregê,
dumahîk Stockholm.

Axx, axxx !

Ez,

birçî me,

tî me,

û ser de jî tew,

cih tune

ku.....!

Axx, axxx !

Rû ji me vegerandin

Hevalan,

dostan,

yanan.....!

Axx, axxx, axxxx...!

Kes nanere li me êdi,

Kes nanêre...!

Ne bav,

ne bira,

ne xwişk

û ne jî

mala

A.....,

P.....,

O.....!

axx,

xxx....!



M. Ûnizê Bedfîsî

EZ IM !



Gurm, gurrrm...!

Agirim, pêt im,

Çirûsk im, şêt im,

Şeng im, peng im,

Teng im, reng im

Pir bi nav û deng im.

Gum, gum,

gurrrm !

Gim, gim,

girm.

(piiirrrrt,

berdeeeeee...!)

BIZOT



JI DÎWANA Seyda **BERDE**

Lêkolîner:
Muxtarê QANQIRTÊ

Ji şairên me yên kevintirîna yek jî Seyda B E R D E ye. Hîn bi rastî mirov dikare bibêje ku li Rohilata navîn şairê herî kevintirîn e. Tarîxa zayina Seyda B E R D E kifş e (200 sal berî zayîna Îsa). Lê, gelek mixabin ku tarîxa mirîna wî hîn nehatiye kifş kirin. Ji ber ku Seyda B E R D E hîn nemirîye û her weha hîna nehatiye kuştin jî, ji ber wê jî divê hun; xwendevan li me biborin û bibexşînin ku em nikarin we di babetekê de agahdar bikin, lê wexta ku Seyda yê me B E R D E mir an jî bimire, an jî bi destê hin kesan ve bête kuştin we gavê berî her kesî emê we xwendevanan di ve bareyê de agahdar bikin,.

Belê, Seyda B E R D E di warê edebiyat, tarîx, cografya, soyolojî, felsefe, psikolojî, astrolojî, biyolojî, filolojî, zoolojî, patalojî, mikro biyolojî, sîsmolojî û di hin LOJÎ yên din de gelek zana bû —Pardon! zana ye, ji ber ku ew hîna nemirîye dive ji alî gramatikî ve em dema nuha bikarbînin.

Belê, Seyda B E R D E gelek zana ye.


Seyda B E R D E her weha bi gelek zimanan jî dizane. Her wekî; zimanê însanan, zimanê teyran, zimanê heywanan. Lê, Seyda BERDE eserên xwe bi tevayî, bi zimanê însanan dinivîse. Tenê çend helbestên xwe bi zimanê mêşan (ji meşan jî mêşên hengivîn) nivîsiye. Em li vê derê wek nimûne helbestek wî çap dikin ku bi zimanê "mêşan" hatiye nivîsîn, dibe ku hûn jê fam nekin le gava ku Seyda BERDE ji pirtukên xwe, ferhenga MÊŞÎ Û ÎNSANÎ çap kir şûn de hun dikarin li wê ferhengê binêrin û ana gore (gor wê) hunê ji helbestê fam bikin.

Helbesta wî ya ku bi zimanê Mêşî nivîsiye ev e:

– IZEZIZIM –

Izezizim, izezizim,
îzez, îzezîzê lizezizim,
Bizerdize, bizerdize
Bizin tize izerdize.

(Sizeydiza BÎZERDÎZE :
ev jî bi zimanê Mêşî navê wî ye)



Belê , her wekî me got, Seyda B E R D E di gelek waran de xebitî-
ye û her weha Seyda B E R D E kesekî *J I H E R A L Î D E P I R A L Î* ye.

Seyda B E R D E heta nuha 40 dîwan nivîsiye (pirtûkên li ser tarîx,
cografya û ziman jî ne tê de) lê, hîna nexistîye çapê, û dîsa Seyda
B E R D E nêzî 60 pirtûkên din jî daye pêş xwe, ger jiyana wî têr
bike, ewê wan jî binivîse, lê wek plan di heşê wî de ye.

Li ser Seyda B E R D E mirov bi hezaran pirtûkan jî binivîse
dîsan têr nake, ji ber wê divê hun me bibexşînin, ji ber ku di kovara
me de jî ji bo nivîsan sînorek heye. Lê emê çend nimûneyan ji
helbest û nivîsên Seyda raxin ber çavan wê gavê hun dê baştir ji
Seyda yê me fam bikin.

Du helbestên wî yên bi nav û deng ku tu caran ji devê gel nakeve,
gelê me ew ji ber kirine û her dixwînin:

EZ Û YARÊ

Ez û yarê,
Li bin darê,
Bi hev şa bûn
Ta êvarê.
.....
.....
(Seyda B E R D E
Bin te erd e.)

TEFŞO

Tefşo, tefşo
Hevşo, hevşo,
Te got tefşo,
Min got hevşo,
Bavê min diya te,
Bir paş hevşo.!

Ji her du helbestên Seyda jî hin rastiyên civatê têne xuya kirin, wexta ku hun kûr û dûr bifikirin.

Helbestek wî yî tasawufî:

Bisîmela, bi sîmela
Bi simêlê bîst mella,
E'l' hemamê, tu l' çola,
E'j' rehmana, tu j' filla,
Malek min dî,
Li wî gundî,
Tê da keçek,
Bûk bi pêçek.



wêneyek wî yî
di pê zayîna Îsa re

Seyda B E R D E her wekî me berê jî got, wî bi xwe gelek nivîsar û makale jî nivîsiye. Nuha emê çend rêz ji makaleyek wî yî menşûr ku di rojnameya TÎNG Û RÎNG de derketibû li vêderê raxin ber çavan, da hun; xwendevan bibînin ku Seydayê me çi felsefeyekî kûr û dûr bi kar aniye.

"..... û tarî daket, ji ber ku ro çûbû ava, gava ku roj diçe ava êdî dibe êvar, çunkî دنیا gulover e."



wêneyek Seyda BERDE
ku 189 sal berî zayîna
Îsa hatiye kişandin

Belê, hun jî dibînin ku Seydayê me çi sen'et û huner bi kar aniye. Lê wekî me di destpêka nivîsa xwe de jî gotibû ku di kovara me de ji bo nivîsan sînorek heye û bi ya me, me hinekî sînor derbas kir, ji ber we jî emê nivîsa xwe bi du helbestên Seyda biqedînin. Helbestên wî (evên jêrîn) bi weznê arûz hatine nivîsîn.


Seyda van her du helbestên xwe jî li ser Mîrkut nivîsiye, lê bi min qesta Seyda tiştêkî din buye, ango ne ku li ser kovara me MÎRKUTê nivîsiye, her wekî min got qesta wî tiştêkî din e. Di hejmara wêbê de

emê hinekî li ser tekilîyên di nav helbestên Seyda û Mîrkuê de jî bisekinin. De vêca biminin di xweşiyê de.

MÎRKUT -1

Vî mîrkuê pir dil şewand
Birînên kevnare kewand,
Singên di 'erdê de tewand
Feryad ji destê mîrkuê.

Mîrkuê, mîrkuê kalanî,
Dar û gopal tev hilanî,
Li bin banî, li ser banî
Feryad ji destê mîrkuê.



MÎRKUT-2

Min qebûl e das û çakûê û tevr û bêr û sîrkuê,
Min nevêê qet tiştekiê din, min nevêê tu car mîrkuê.



EZ Ê PÊ ŞORBÊ VEXWIM !

Carekê gundiyeke diçe li malekê dibe mêvan. Kebaniya malê jê re şorbê tîne datîne ber, lê kevçî ji bîr ve dike. Mêvan dinihêre ku kebanî serwext nabe, dibêjê:

—Xuşkê, xuşkê ca ji kerema xwe tu dikari ji min re kêrê bînî.

Kebanî:

—Mêvanê delal ma tu yê çî bikî bi kêrê ?

Mêvan:

—Ez ê guhê xwe jêkim, bikim kevçî ku pê şorbê vexwim..!



Ji Folklorê

NE DIXWE NE JÎ DIDE HEVALAN
GENÎ DIKE DAVÊJE NEWALAN.



Kesê hesûd, çikos, (kariyerist)



SERBÛRÎYEK



Ez wan rojana ji xwe re li çarşiyê digeriyam. Ê de ez dibêjim çarşî hun kuçeyekê an jî tenê papûrekê(cadde) fam nekin. Çarşiyekê ku her der wê kuçeyek, hem jî kuçeyên fetlok fetlokî. Ez daketim kuçeyekê, nêta min hebû min ji xwe re tiştê bikiriya. Ez çergî(cawa ku) daketim kuçeyê min hew nihêrt ku li pêş min deriyek, li ser derî jî tiştê hatibû nivîsîn. Welê hema min li dora xwe nihêrt ku kesek tune ye û ez bi carekê de daketim hundur. Lê ez çi bibînim, ez gelekî şaş mam, li xwe heyirîm, hemû li dora min rêz bûbûn, min hemûyan di ber çavên xwe re derbaskir, lê na, na be. Min carê serê xwe di ber xwe de xwar kir, hinekî fiki-rîm, ponijîm gelo ez çawa bikim, û min serê xwe rakir, li pêş xwe nihêrt ku çi bibînim, wele hema min xwe avêt ser, hişk pê girt û danî ber xwe, min pêşî li binê wê nihêrt, erê, tamam e, eynî ew e, wele hema min zû zû qeytanên wê vekir û min ê xwe jî vekir, min yên xwe danî wê kêlekê û min ew girtin kirin piyê xwe, lê ! gelek mixabin ew jî nebû, ji ber ku ne 43 numare bû, axirê min îro jî cotek sol ji xwe re nekirî.

Ardoyê BÊŞIMIK

PÊKENÎNEK



Li dibistanê mamosta ji Lezgîn dipirse:
 -Lezgîn, tu herfên elfabê hemûyan dizanî ?
 -Belê mamostê min, dizanim.
 -Ê de ka bêje, di dû herfa A'yê re kîjan herf tê ?
 -Di pê A'yê re hemûyên herfan tên..!



Kontax



Divê xwendevan çewt tê negihîjin, ji ber ku KONTAX du maneyên xwe hene:

- 1-Dîn,rentele,beredayî,şêt,perçe,xînt
- 2-Têkilî,peywendî,hev û du naskirin.

Em di vê derê de kelîmeya KONTAX'ê di maneya têkilî,peywendî û hev û du naskirinê de bi kar tînin.Ji ber vê yekê divê xwendevanên me yên baqil zanibin, da nekevin çewtî - yan her weha dîsa divê xwendevanên me yên baqil(ne dîn) divê ji xwendevanên ku dînin (ne baqil) re jî vê yekê bibêjin ku da bila xwendevanên me yên dîn jî nekevin xeletiyar.

Zor sipas !
MÎRKUT




Ev rûpel ji bo kesên ku dixwazin bi rêgayî Mîrkut hevûdu binasin re ye.Belkî xwedê bi alîkariya Mîrkut îşê wan li hev bîne.



1- STOCKHOLM-M.Q.O.361-


Min kiçêkî zor qij zerd im û hemîşe kurd im. Temenim em roke buwe be 36, belam min wa ezanim ke eme rast niye,xelet e. Le ber katê ke min le dayik bûme, ew kate bawkim le cenûbî 'Iraq da kar dekird, daykim le şwênî ba wkim çûwe bo daîreyî nufûs, we le wê tarîxî ledayikbûnî min nusrawe, ke min delêm eme xelet e, debê temenim 35 be. Belam eme girîngî niye,35-36 ferqî niye. Êste min le Siwîd de-jîm, min zor hezî le natûr wate tebîet û mûsîqayî xerbî ekem. Zor pê m xoş e ke le gel gence kurdekanman têkilayî wate peywendî bizozimewe.Êwe etiwandin namekantan le ser em kode "MQO-361" be kurdî,ingilîzî, siwîdî,ferensî, elmanî,erebî û farisî binêrin.

Awatim namekantan e !




2- UPPSALA-Malxirab.371-

Ëro ez tebîî me, salê mi 26 i, çî weri ber devê mi dibê, dixwazim bi keçikeke ku çî tê ber devê wê dibê re Qontaxê deynim. Hoby'ên mi; keçî ka ku ji mi ra mektûbê bişîni ji çî hez biki ez ê jî wan tiştan hez bikim. Li hêviya mektûba we me. Hinekî zû...!




3- HOLLAND-Mutewassif-381-

Ez qeble ewwel xort lê elan 'emrewasat im, ji aîleyeke mutewessif im. Dixwazim bi keçikeke ku ji aîleyeke mutewessif hatibe re elaqet-el heyat-el tewîl bisicilînim. Ez li bendî mektûbên we me. Bî sur'a biersilînin...!



4- DANMARK-EzîKurdîm-391-

Ezî kurd im, yaşê min 30 e. Ez arasira duşun mîş dibim, ev heyat wengî nabe. Ev ne yaşamax e yaşamax dêdixin gereke merî qontax yapmîşke, insanan tanimîşke. Bo tanimaxê jî gereke em ji hev ra yazmîş nikin. Ez mektûbê we beklemîş dikim, yazmîşkin ...!



5- ALMANIYA-De Haa-401-

E jî kurd im, tu jî kurd î, de bişîne ha, ma tu l' wê, e l' vê, tu ji zanî, e jî zanîm, xwedê jî zane. Ma niza tu l' hêvya çî yî ?

Muzîk: e jî hez dikim,

Tebîet: welleh, e ji wê jî hez dikim,

Dans: boy xatirê te ew jî erê,

Bob Marly: nizam çî ye, lê ew jî erê,

Demîs Rouseaus: erê erê, ew jî erê

de bişîne haaa...!



Ji Folklorê

Lawko dîno,
Şevkê were mala bavê min bi dizîka
Derî veke bi tilîka,
Wextê bav û birê min gote
çî buye çî cîriya,
Ezê bêjim kûze bû hat mirîşka.





DERDÊ XWE
JI DOKTORÊ XWE RE

BIBÊJE !
Dr. Bijîşk

(Ji vê û bi şûn de di vî beşî de dê Doktorê we Dr. Bi-
jîşk wê bersiva hemû nexweşiyên we yên bi her awayî bide
Nuka ji ber ku hîn tu name ji nexweşan nehatiye, Dr. Bijîşk
dê tenê hin çareyan jibo hin êşên nexweşan pêşkêş bike.)

- 1) Ger serê we êşiya tabletên serêşê bixwin.
- 2) Ger diranê we êşiya tabletên diranêşê bixwin.
- 3) Ger çavê we êşiya tabletên çavêşê bixwin.
- 4) Ger zikê we êşiya tabletên zikêşê bixwin.
- 5) Ger guhê we êşiya tabletên guhêşê bixwin.
- 6) Ger pozê we êşiya tabletên pozêşê bixwin.
- 7) Ger sînga we êşiya tabletên sîngêşê bixwin.
- 8) Ger pišta we êşiya tabletên piştêşê bixwin.
- 9) Ger lingê we êşiya tabletên lingêşê bixwin.
- 10) Ger dilê we êşiya tabletên dilêşê bixwin.
- 11) Ger pişika we êşiya tabletên pişikêşê bixwin.
- 12) Ger destê we êşiya tabletên destêşê bixwin.
- 13) Ger ciyekî we yî namahrem êşiya tabletên namahremêşê
bixwin.
- 14) Ger derekî we naêşe wê gavê hun ne nexweş in, ji ber
wê jî pêwîst nîne ku hun tabletên êşê bixwin.

Heta hejmara din bimînin di
bê êşiyê de.

Dr. Bijîşk

GELO HUN DIKARIN VÎ MAMIKÎ
PÊNC CARAN LI SER HEV BIBÊJIN?



"Ez çûm ber çem min du sing anî
Min yek kuşa kadîna kayê,
Min yek jî da destê dayê ! "



BAVÊ MIN JÎ DIBÊJE !



Du zarokan bi hev re qise dîkin:

Yekî ji ê din re:

—Bavê min dikare li bavê te xe !

Yê din:

—De wê de here lo, tu jî hema derewan dikî !

Yê din dîsa:

—Birayê min jî birayê te baqil û jîrtir e !

Yê din:

—Derew, te dîsa derew kir !

Yê din dîsa:

—Dîya min jî diya te xweşiktir e !


Yê din:

—Haaa, ha ! a îcar te rast got, lewre bavê min jî her tim vê yekê dibêje !!!

HINDIK-RINDIK

MIŞKEK HEFT KÛPA DIHERIMÎNE

TASA VALA
ÇINGÎNÎ JÊ TÊ



Ju jî bi têtjikên xwe şa dibe û dibêje:

—Ez bi qurbana pûrtika we
ya hevrîşim bim !


ROJA BI DÛMAN E
KÊFA GURAN E.

?

RÛREŞIYEK

Serokê C.T.(Cumhûriyeta Turkiyê)yê Ken'an Ewren di meha borî de li bajarê Diyarbekrê li mazata pêz de nutûqek dûr û dirêj kişand. Û piştî axaftina xwe (wekî li her bajarî wisa dike) cilên xwe yên resmî danî û yên sivîlî li xwe kir, ango tedbîl-î qiyafet kete nav bajêr. Hinekî di nav bajêr de gerya bi şûn de bi dizîka berê xwe da kerxanê, Ken'an EWREN li wê derê(dûrî cime'atê) îşê xwe qedand şûnde dest avêt ji bêrika xwe de kû perê keçikê bidê, lê hat bîra wî ku wî perê xwe li GOKDELEN'ê ji birve kiribû, Ken'an Ewren ji keçikê re got"ezê dawiyê ji te re bi postê bişînim". Keçik qeherî biser Ken'an Ewren de gîrya û bi n'alîn û terlikan bi canê Ken'an Ewren ket, qîjîn û hawar bi wî xist.

Ev bûyer derhalkê ango bi carekê de li bajarê Diyarbekirê belav bû.Çûk û mezin hemû kesan ev buyerbihîstin.Piştî ku ji alî her kesî de hat bihîstin bi şûn de, Giregirên Cumhûriyeta Turkiyê û Parlametoya Bedilhewa ligel hev bi hev re civînek gelek mezin pêk anîn. Civîn gelekî ajot. Lê li dawyê hemû gehîstin biryarekê û jibo vê bûyerê çend canûn jî derxistin.



Biryarên ku Giregir û Parlamentoya Be
dîlhewa bi hev re girtibûn ev in:

Ji bo ku xelkê Diyarbekrê qala vê rû-
reşiyê nekin;

1- Çar qor leşker wê dora Diyarbekrê
bigrin da bila kes nekeve hundurê ba-
jêr û her weha derketina ji bajêr jî qe-
dexe ye.

2- Devê hemû kesên ku li Diyarbekirê dijîn
wê bête bant kandin, ji bo ku li gel hev
nepeyivin û behsa vê bûyerê nekin.

3- Ji bo bicîhanîna van tedbîran jî divê
ji BANKA DINÊ, IMF û ji U.S.A.'yê û
ji hin dewletên 'Ereban krêdî û deyn
bê stendin.

Cerdoyê FATÊ

Nîçevanê MÎRKUT ji Diyarbekirê



DU HELBESTÊN DIN

AX !

ax

dunya

axxx!

ma

tu

çima

gulover î ?

çima

ne

çar goşe yî ?

Dr. Pir-Ço



Mêrê mêran

Mêrxasê jîran

Serê xwe rakir

Wekî qertelan

Hêdî hêdî û giran

Nihêrt li der û doran !

Kêrtoyê KUNDÊ

LYCEE an LICÊ

Li dunyê yekem Lîse li bajarê LICÊ (qeza Diyarbekir) hatiye ava kirin; piştî ku Awrûpayî hatin Licê, plan û programa mektebê dizîn, birin li welatê xwe gor vê plan û programê mekteb ava kirin. Di demek gelek kurt de ava kirina van mekteban li her derê Europayê belav bû.

Navê mekteban jî biguherîna herfekê kirin "Lîse", gava ku dinivîsin jî wek eslî weha dinivîsin : "Lycée" lê wek "Lîse" jî dixwînin. Niha jî dexî, mirov ji kîjan kesê Awrûpayî navê bajarê Licê bipirse hemû pê dizanin.

DU PEYVIKÊN NÛ

1- Kaşkaşokaserhesin=TRÊN

2-Nihêrtokaleyistok =TELEVÎZYON

Û DU SYNONÎM

1-Xweşkirin = Rûnkişandin

2-Tolazî = Lingêşikestî



Rojekê şivanek diçe bajêr. Dinihêre ku yek derketiye ser minarê û bang dide, diqîre. Şivan jî yekî dipirse:

–Evê hanê jî bo çi derketiye wê derê û weha diqîre ?

–Ew jî bo nimêjê bang dide, azanê dixwîne.

–Nimêj çi ye ?

–Nimêj, nimêj e ! Îbadet e jî bo xwedê.

–Ma zerara pêz tê de heye an na?

–Na, na zerara pêz tê de tune.

–Ê wê wextê bila bang bide, madem ku zerara wê li pêz tune, hema dilê wî çiqasî dixwaze bila biqîre...!





nesîhetek

MIROV ÇAWA LI QAHMÊ RÛDINE

Gava hun diçin qahwê, wekî her kesî ji xwe hun derî vedikin, derî vedibe, hun dikevin hundir, derî yê ku we vekiribû û hun têre ketibûn hundir bi xwe tê girtin ji ber ku YAYLÎ ye.

Belê, we derî vekir, hun ketin hundur, pêşî hunê çavên xwe li maseyan bigerînin, ji xwe wekî hun jî dizanin û em jî dizanin, mumkun e hinekên din jî bizanibin, zatî Xwedê ji ewel de zane ku di qahweyan de gelek mase û kursî hene. Pêşî hunê çavên xwe li maseyan bigerînin, ger we maseyek vala dît wê wextê hun dê xwe nêzî wê maseyê bikin, lê divê maseya ku we dît bi kêmanî çar kursî li dorê hebin an na wê gavê nabe.

Belê, we maseyek dît, we xwe nêzî masê kir; hêdî hêdî hun hatin ber maseyê, teb'en çenteyê we jî di milê we de, an jî di destê we de ye. Pêşî hunê çentê xwe deynin ber masê, di pê re hunê ji çar kursîyan kursîyekê hinekî bi paş de bikşînin, we kursî bi paş de kişand bi şûn de îcar hunê bi centîlmenî û bi awayekî kontwarî paltoyê xwe ji xwe kin, ger havîn be wê gavê jî hunê çakê xwe ji xwe kin. Belê we ji xwe kir, çakê an palto muhîm nîye, em bibêjin palto. Ger we paltoyê xwe jî ji xwe kir şûn de îcar hunê paltoyê xwe deynin ser wê kursîya ku we paş de kişandibû, belê karê we yê yekem diqede, îcar dor tê ser karê duwem; di halê duwemîn de îcar hunê dest biavêjin (bê ma'ne) kursîya duwem, hunê wê jî hêdî hêdî bervî xwe bikşînin û têxin rewş û halekî welê ku êdî hun karibin li ser rûnin. Belê we kursîya duwem jî kişand û xist halê ku mirov bikaribe li ser rûne, karê we yê duwem jî qediya. Karê sêyem jî li ser kursîya sêyem e, vêca aqibeta ku we li serê kursîya yekem û duwem anî hunê wê aqibetê bi serê kursîya sêyem de jî bînin ango hunê wê jî bikşînin bînin deynin nêzî kursîya duwem, ya çaran ew jî her weha hunê wê jî deynin

kêleka çepê ya kursîya duwem. Belê, we karên xwe yên bin gehîn qedand, berîya rûniştinê hunê destê xwe bavêjin ji bêrika xwe de, cixare û hestê xwe derxînin deynin ser masê, ji xwe xwelîdank ji berê de li ser masê heye, ger tunebe jî muheqqeq li ser maseyeke din heye hun dikarin ji wê derê bigrin, we ew jî qedand bi şûn de îcar hûnê hêdî hêdî û giran giran bi stîleke kontwarî li ser kursî ya duwem rûnin. Kursiya sêyem ku li alî we yê rastê ye hunê wê bikşînin bin destê xwe yê rastê, kursiya çarem jî ku ew jî li alî çepê ye hunê wê jî bikşînin berbi xwe û destê xwe yê çepê jî deynin ser wê, her du lingên xwe jî hunê berbi pêş dirêj kin, ger kursiya pêncem hebe û hun lingê xwe deynin ser wê dê baştir bibe, lê ger tune be jî wekî me got hunê wer bikin.

Belê, nesîheta me ya yekem ev e, ku we van maddeyan hemuyan bi cih anîn şûn de êdî hunê li hêvî ya şagirdê (garson)ê qahwê bin ku da bila were we bavêje derve-par don ! bê hemd ji devê min derket, na na, ne welê ye- bê lê şagirdê were hunê jî qahwe an çayekê jê bixwazin û bî dilekî rehet û bi bêhneke fireh hunê qahwe an çaya xwe vexwin ... !

Heta nesîheta duduyan bimînin di nav kursiyên de. !

Pendbêjî Govarî MÎRKUT
Mendoyê Îsa

HELBESTEK

TIŞT

SURREALIST

tîşt
tîşt
tîşt
her tîşt
pir tîşt
ne tîşt
tu tîşt
kêm tîşt
tîşt jî tîşt dibe tîşt
bê tîşt, tîşt nabe tu tîşt !

AYIB



contens, contenu,
inhalt, innehåll,

içindekiler, tedexul û yên me...

Zimanê me zimanekî zor zor, pir û gelek û zaf dewlemende. Bi rastî hela tewr-xwedê kêmanîya wan bide- (*pardon! nede*) hin zimanzanên me hene ku bi kar û bar û şuxul û xebatên xwe yên îlmî-zanistî zimanê me hîn dewlemendtir dikin, ber bi pêş de dibin. Hela tewr gava ku bi tirkî, farisî û erebî an jî bi zimanekî din difikirin û bi kurdî dinivîsin, ger rastiyê bibêjî, wê gavê ew zimên gelek dewlemend dikin, bê-je û peyv û ûşeyên nû, tabîrên nû dixin nava zimanê me û zimanê me jî welê dewlemend dibe ku êdî miletê me (ên ku bi xwendinê dizanin) pêre nagihîjin ku xwe fêrî bêje û peyv û ûşe û peyvik û gotinên nû bikin. Ji ber ku zimanê me roj bi roj (*heta hin kes dibêjin seet bi seet*) bi saya van zimanzanên me pêş de diçe, heta welê pêş de diçe ku, mirov gava ku ferqên di nabêna kurdiya mehek berê û mehek şûn de (wekî kurdiya meha tebxê û îlonê) dide ber hev, bi serê xwe tenê ji wan peyvik û ûşe û gotinên nû ferhengêk pêk tê. Jiber vê yekê jî divê mirov jibo kesên xwende qurseke zimanê Kurî dî veke ku hîn baştir xwe fêrî zimanê xwe bikin û her weha divê mirov mehê çarekê jî ferhengêkê derxe.

Ger hoyên xuzayî pêk neyên û hingavên
li pêşberê pêvajoya gehîneka te jî ji holê
bête rakirin, ew kate ji alî naverokî de
tu dikarî birêveçûyîna xwe bégelîş bidomînî...!



Nuha emê li vê derê mîsalekê (hun dikarin wekok, mînakî nimûne jî bikarbînin) raxin ber çavên we ku wê gavê hunê bi xwe jî bibînin û fam bikin û her weha tê jî bigihên ku di saya van zimanzanên me de zimanê me çiqas pêş de çûye.

Belê, wekî me got, emê tenê li ser bareyek (mewzûyek) ê mînakekê bidin.

Kelîmeyek (hun dikarin wişe, ûşe, peyv, peyvik, gotin, qise bêje, xeber, qezî jî bikarbînin) heye ku Ingilîz jê re dibêjin **CONTENS** Fransiz dibêjin **CONTENU** Alman dibêjin **INHALT** Swêdî dibêjin **INNEHÅL** Tirk dibêjin **İÇİNDEKİLER**. û Kurd jî dibêjin:

- | | |
|--------------|-------------------------|
| 1) Têdayî | 11) Yêtêda |
| 2) Têxistinî | 12) Zikîda |
| 3) Serecem | 13) Dizikda |
| 4) Naverok | 14) Zikî (yê di zik de) |
| 5) Nawerok | 15) Di hundur da |
| 6) Têkirinî | 16) Di vê jimarê da |
| 7) Hundurî | 17) Di vî hejmarî de |
| 8) Têda | 18) Lem jimare da |
| 9) Fêhrist | 19) Fêhristî basekan |
| 10) Navî | 20) Fêhristî em jimare. |



NAVÊN KURDÎ

Ji bo zarokên we yên ku dê nû çêbibin (bo keç û kur)

Bî amadekarîya
Romanîûs LEBENDEYÎNOELÎSÛS



Agirbizot
Agirpêket
Ardmalêketo
Belqityo
Belqityê
Bêderpê
Baberda
Bindamayê
Biserneketo
Berxiyar
Bintûmaxa
Bêleme
Cilo
Çavbeqo
Çavlıderê
Çirya
Çogdiberde
Devjiheve
Doxinsist
Diranqîj
Diranpîj
Destçooal
Devlihewa
Devşorbe
Erdêmawo
Erdêketo
Firnîk
Fîtefît
Guregup
Gurmin
Gurpegurp



Gumegum
Guhbel
Gurxwaro
Herhazir
Herlibende
Hûrgir
Kojo
Keftar
Kefteleft
Kêrto
Karo
Kormîşk
Limalmayê
Libendeyê
Niçooalê
Pirtenîk
Porgijgij
Parsuxwar
Piştixûz
Pêdirêj
Pozxwar
pozqertel
Pîntîberde
Rûşuştî
Rûgermiçî
Sîtilqûn
Têdamayê
Qurqurbeg
Çavnûtîk
Mellêbuharê
Zimankurt
Zikliser
Zimandirêj



LÊ BI RASTÎ EZ NE DEREWÎN IM



Hemoyê XUDARÎK

Gelek heval hene ku dibêjin qey ez her derewan dikim, lê bi rastî, min heta nuka qet derew nekirine û ez nizanim gelo ev millet ji ku derê der dixin ku ez derewan dikim. Ez çî bibêjim hema dibêjin "derew e" Le bi rastî ez jî nizanim ez çî bikim.

Çi ye, efendim min gotiye kalik (bapîr)ê min û Hîtler bi hev re mekteb xwendine, ê de ka derew di ku der vê de ye. Her weha dîsa kalikê min û Çorçîl jî bi hev re mekteb xwendine. Lê ev nayê wê maneyê ku her duyan bi hev re di sinifekê de xwendine. Kalikê min wexta ku li Diyarbekirê mekteb dixwend di eynî wextê de Hîtler li Almanya û Çorçîl jî li Englandê mekteb dixwendin. Ma gelo nizanim kanê derew di kuderê de ye. Ma gelo qey ne wilo ye.

WEXTA KU
ME DIXWEND,
HÎTLER.....!



XALÊ MIN Ê BI LINGEKÎ,
DIAJO GARANA GUNDEKÎ

Mirkut

BÎLLEHEQ NEPÊN,
EZ NAYÊM.

Erzanî

Ev rûpel aîdî zîmanzan Pîrêfissor Fîolog Dr. Bariûs JIBERXWEVAAVÊTÎÛS e. Berpîrsîyarê tehlîl û dîtînen li ser kelîmeyan ew bi xwe ye. Divê bête zanîn.

Destey Nûseranî Govarî M Î R K U T



Tahlîla Kelîmeyên Kurdî

*Bi amadekarîya
Pîrêfissor Dr.*

Bariûs JIBERXWEVAAVÊTÎÛS

Kelîmeyên kurdî ne ku ji ber xwe ve çêbûne, hemû kelîme(peyv) bûyereke wan, serpêhatîyeke wan heye, yanê gava ku em dibêjin derpê an jî deling, ew ne ku ji ber xwe ve hatine çêkirin, kelîme goreyî pêvajoya dîrokî û jiyana civakî drûvek stendîye û hatîye gehîstîye vê rojê.

Belê, em dîsa werin ser wan her du mîsalan derpê û deling, derpê ji du kelîmeyan pêk hatîye: 1-der

2-pê

derji dihere, diçe'yê hatîye, pê jî ling, nig e, û herdu bûne yek, bi hev ve helîyane bûne derpê ango ê ku diçe pê; diherepê, deling jî her weha ye, ew jî ji dihere lingê hatîye, yanê ji du kelîmeyan pêk hatîye, yek fîlîla dihere/diçe ya din jî ling/nig, herdu bi hev ve zeliqîne, helyane bûne yek kelîme yanê deling, her çendî hin kes hene ku dibêjin ev kelîme ji DEV+LING'ê hatîye lê belam bi min ev dîtînek çewt û xelet û ji zanîna lînguîstîkîyê dûr e.

Belê, bi min we êdî fam kir ku ezê di vê rûpelê de çî binivîsim û tahlîlê kelîmeyan bi çî awa yî bikim. Ango gotîna min ; ezê ji vê û bi şûn de di vê rûpelê de ji we re tahlîla kelîmeyekê bikim.

Kelîmeya me ya vê hejmarê HEVRÎŞÎM e, her wekî hun jî dîzanîn hevrişim di nava kurdan de di maneya helîl, herîr, îpek de tê bi karanîn.

HEVRÎŞIM ji pênc kelîmeyan pêk hatiye:

- 1-hev
- 2-û
- 3-du
- 4-vereşandin
- 5-mêş

Belê belê Hevrîşim ji van kelîmeyan pêk hatiye, ango ji HEV Û DU VEREŞANDINA MÊŞÊ hatiye. De ka we rin vêca em li pêvajoya wê ya dîrokî binêrin, da çawa ev pênc deng bi hev ve helyane û bûne yek deng.

Cumleya me weha ye:

H	E	V	Û	D	U	V	E	R	E	Ş	A	N	D	I	N	A	M	Ê	Ş	Ê
↓	↓					↓	↓	↓	↓			↓					↓			
H	E					V		R	Î	Ş			I				M			

û van herfên jorîn bi hev ve zeliqîne, bi hev ve helyane bûne yek kelîme, yanê:

HEVRÎŞIM

Di hejmara wêbê de emê li ser kelîmeyekî din tehlîla xwe berdewam bikin.

Heta hejmara din bimînin di xweşiyê de...!



ERO EM JÎ DI AWAYÊ NIVÎSÎNÊ DE
KUMIK BI KAR TÎNIN; DIVÊ HAYA WE
JÊ HEBE...!

▲
M I R K U T

KURTE ROMANEK

OF, OFF !

'Hemcûnê Emîna Bajart

Of! ji xwe aciz im, bi xwe re ranagrim ku ji xew ra bim, lê divê rabim, ji ber ku dibistan di heşt û panzde han de dest pêdike, seet jî heşt kêmbîst, heta ku rabim û cilên xwe li xwe kim, bê xwarîna ya bigihîjim ya negihîjim. Rabûm. Min hinek av li ruyê xwe kir, bi xaw liyê ser çavên xwe hişk kir şûn de, li ber eynikê min porê xwe şeh kir. Bi por şehkirinê re min li eynikê jî dinihêrt, hema bi derbekê min hew dît ku di eynikê de şiklek! Çi şikil bû ! Çi ruyekî ecêb û tahl û tirşokî û pozekî xwaro-marî, du çavên nûçe xewt û bijangên bi kêltşk. Demeke dîr û dirêj ji ciyê xwe nelepîtîm û min û yê eynikê me î hev nihêrt, em bi hev re wek hev hinekî fikirîn, em bi paş de çûn, bi şûn de, em çûn wan rojên paşeroj ên bort...! Min jê pîst:

-Gelo salên te çend in ? got:

-50

-Ê min jî.

-Di nav van 50 salan de te çi kir?

-Qet, tenê çûn û hatin, xwarin û vexwarin û tuwalet !

-E' jî her wekî te.....!

-Ê tu nuka çi dikî ?

-Diçim qursa zîman !


-E' jî.

QEDYA

HELBESTEK DADAÎST

	ting				
		ting		ring	ring e
			ting	û ring	û ring
TING	û ting	û ring		û ting	û ting
	û ring	û ting		û ting	
	ting ting	e		û ring	
	ting teng	e		ting ring	
	teng ting	e		ring ting	
	reng ring	e		tiinnnggggg...!	

Ayib



BANGEK!

Roja Nehşemîyê di meha 13'an de li bajarê Parîs, Stockholm, Sidney û Kopenhag'ê dê meşek çêbibe. Meş li dij sefaretên Swêd, Almanya, Awustralya, Fransa û Danîmarka'yê ye. Amanca meşê; ji bo bi cîh anîna hin mafên civakî ye, ango ji ba zêdekirina perê SOSYAL'ê (Mala APO, Malî MAM) û ji bo perê cilê sporê ku nadin.


CIYÊ MITÎNGÊ: LI HERSÊ BAJARAN JÎ, LI MEY DANA FIREH DE DESTPÊDIKE.
SEET: PIŞTÎ NÎVRO.

XWÊNDEWARÎ XOŞEWÎST

MÎRKUT govarêkî kurdî ye,
çawerîwanî pêşeneyar û
rexney êwey berêz dekat..!



MİR KUT



KOVARA HER TIŞTÎ YE JI BO HER KESÎ YE

Mîrkut jimare 2^ê dê di demek kurt di
derkeve, bipên...!

Hin nivîsên jimare 2

tehlîla keltmeyan

elvîs presley yan

f'ala we.....

deng û bahs

roportajek bi malbatek

kurd re...

kurteromanek.....

çewtiyek (li ser xelata
NOBEL'ê....

serpiştê ket çavên wî

sax bûn, berçavka xwe avêt....

civîna li Parîsê.....

KEN-KLUP.....

trên li ku îcad bû.....

ji pencera rexnegîran....

çend pirtûkên nû.....

karîkatur.....

û hîn gelek nivîs û helbest

û exbar û meqele û ger hun biştînin
nameyên we..!



" Ji vê û pê ve, li Turkiyê, di mekteban de
dê dersa MÎRKUT jî bête xwendin...!"

Mîrku
KOVARA HER TIŞTÎ YE JI BO HERKESÎ YE

Xwedî û Berpirsiyar: **Mahmûd LEWENDÎ**

Adress/Navnîşan : c/o Östberg
Folkungag. 78 3^{tr}
116 30 Stockholm - Sweden

Prix/Buhayê wê : 10 SKr. - 10 FF. - 3 DM.

